Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 161
21'ê Hezîrana 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Di Hezîrana sala 1930'î de, lîderê Kurd, Simkoyê Şikak hate şehîdkirin, lê riya xebata wî heya gihîştina bi azadiyê berdewam e

31'mîn salvegera avakirina "Radyo Dengê Kurdistana Îranê" pîroz be

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi

**Amerîka li Kendawê** binkeya esmanî ava dike

R: 5

**Nûçegihanek taybet yê** mafê mirov bo Îranê hate diyarîkirin

R: 9

**Rêzdar Mistefa Hicrî di civîna** Kurdên Alman de



R: 7

# Rihê berxwedanê di meha Pûşperê de bihêztir dibe




## Bidestxistina 36 kursiyan deskevtekî baş bû

**Roja 12'ê Hezîranê hilbijartinên parlemanî di Turkiyê de birêve çûn. Di vê hilbijartinê de nêzîk %90 a xelkê, beşdarî di hilbijartinê de kirin, û nûnerên dilxwaze xwe hilbijartin.**
**Di hibijartina vê carê de Kurdan bi bidestveanîna 36 kursiyan karîn ku serkevtinek berbiçav li gorî hilbijartinên pêşîn bi dest bixin.**

Çend rojan piştî vê hilbijartinê li bajarê Diyarbekirê, Bloka Ked, Demokrasî û Azadiyê kombûbû, û di vê civîna xwe de, biryar dan ku berî merasîma sondxwarinê, Koma BDP'ê bê avakirin.



Di civînê de rewşa dawî û rewşa hilbijartinê hate nirxandin. Herwiha ji bo deklarasyonê komîsyonek hat avakirin. Komîsyon ji Hevserokên Giştî yên BDPê Hamît Geylanî û Fîlîz Koçalî, parlamentera Sêrtê Gultan Kişanak, parlamenter Şerafettin Elçî û parlamenterê blokê yê Stenbolê Levent Tuzel pêk tê.

Herweha roja 20'ê Hezîranê berbijarê serbixwe yê bajarê Mêrdînê Ehmet Turk di serdana xwe ya bajarê Sêrtê de ji bo birîndarên şahiya piştî hilbijartinê, daxuyaniyek da. Turk di axaftina xwe de got "Ger 6 namzetên serbixwe ên ji aliyê gel ve hatîn hilbijartin û li ser doza KCK hêj girtîne neyên berdan, naçin meclîsê."



**Qonaxa piraktîzek irina soz û** peymanan

Selim Zencîrî

Piştî midehek zaf ji çavnihêrî û heyecanan, serencam 24'mîn gera hilbijartina parlimanî a ... R: 4



**Lîderê Kurd pîlan jêre** hate darêtin

Şehab Xalidî

Simayîl axa, kurê Mihemed axa naskirî bi Simkoyê Şikak piştî şerê yekemîn ê cîhanî... R: 6



**Diyardeya penaberiyê, berhema** pêkhateyên siyasî yên nedemokratîk e

Sadiq Vehdanî

Penaberî diyardeyekî dîrokî ye ku rîşala vê tirajidiyê ji hegerên siyasî, olî, regezî û netewî ve... R: 8



**Qêrînek ji Qendîlê bo Agirî û Dalaho:**

**ÊRE DENGÊ** KURDISTANA ÎRANÊ YE

Ceifer Mubeşirniya

Ger damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê û avabûna Komara Kurdistanê... R: 11

www.kurdi.org

# PDK Îranê derheq hilbijartinên parlemanî di Turkiyê de daxuyaniyek weşand

Roja 12.06.2011'an, hilbijartinên parlemanî li Turkiyê birêveçûn û bo carek din Partiya Edalet û Geşepêdanê bi serokatiya Erdoxan rêjeyek berbiçav a kursiyên perlemanê bidest xist û di hemen dem de çend partî û aliyên din jî karîn beşek ji kursiyên perlemanê bidest bixin.

Girîngiya hilbijartinên roja 12'ê Hezîrana îsal li Turkiyê pêtir ji vê nêrînê ve tê mêzekirin ku partiya desthilatdar û serkevtî ya vê carê, bi dirûşmên guherîna Yasaya Bingehîn a wî welatî derket qada rikeberiyên hilbijartinan û pêşkevtin di vê rikeberiyê de nîşaneya vê yekê ye ku xelkê Turkiyê bi rêjeyek berbiçav ji kar û kiryarên partiya desthilatdar razî ne û di hemen dem de deng bo guherîna Yasaya Bingehîn a wî welatî dane ku Partiya Edalet û Geşepêdanê bangeşe bo dikir. Guhertina yasaya bingehîn a Turkiyê ger bi vî awayê ku hatiye ragihandin bi armanca berfirehtirkirina demokrasiyê bi pîvanên navnetewî be, dikare dilxweşker be heya ku kêmasiyên Yasaya Bingehîn a niha nemînin û yasaya nû berhevkerê wan maf û azadiyan be ku demokrasî bi manaya rastîn a xwe bo sercem pêkhateyên Turkiyê û yek ji wan Kurd bi rewa dibîne. Em hêvîdar in ku Yasaya Bingehîn a Turkiyê pêvajoya han derbas bike û bi arasteya demokrasiya rastîn de bimeşe.

Xala din a balkêşe vê hilbijartinê, beşdarî û rola Kurd di vê pêvajoyê de bû ku 12 partî û saziyên ne hikûmî di bin navê bereya Ked, Demokrasî û Azadî, de bi hevre derketin qada hilbijartinan û hejmarek ji kursiyên perlemanê ji xwe re misoger kirin.

Herçend rêjeya wan kursiyên bidest hatî li gor heşîmeta Kurd li Turkiyê rêjeyek zaf nine, lê bi berhevdan li gel hilbijartinên berê, pêşveçûnek berbiçav bi xwe dîtiye û hejmara kursiyan jî berbi jor çûn ku bê guman serkevtina han berhema yekdengî û bihevrebûna wan partî û aliyan e ku di vê hilbijartinê de, dest dabûn destên hev.

Serkevtina han bo aliyên Kurdî weke encama bihevrebûnê, bê guman ezmûnek dibe ku Kurd li Turkiye di pêşerojê de û di pêvajoya guherîna Yasaya Bingehîn a wî welatî de, dê vê bi hevrebûnê biparêzin û di pêşerojê de di çarçoveyeke firehtir û yekdengiyek bi bandortir xwe derbixe holê.

Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi boneya serkevtina hilbijartinên roja 12'ê Hezîranê, pîrozbahî ji sercem xelkê Turkiyê bi giştî û ji xûşk û birayên me ên Kurd li wî welatî bi taybetî dike û di hemen dem de hêvîdar e ku Yasaya Bingehîn a nû ya Turkiyê berhevkerê hemû ew maf û azadiyan bo gişt xelkê Turkiyê be ku di demokrasiya rastîn de gerek hebin û herweha rêxweşkerê berhevbûna mafên netewî ên Kurd li wî welatî be û rewşa navxweyî a Turkiyê û siyaseta derve a desthilata wî welatî bi arasteyekê de bimeşe ku serokê Partiya Dad û Geşepêdanê di axaftinên piştî ragihandina akama hilbijartinan de amaje pêkirin.

Bi taybetî beşdariya hemû pêkhateyan û yek ji wan Kurd di desthilata welat û berhevbûna mafên wan, dikare berjewendiyên Turkiyê û rewş û zirûfek baştir ji bihêztir a wî welatî di civaka cîhanî û deverê de misoger bike. Guman di vê yekê de tune ku cihgîrbûna demokrasiyê bi pîvanên navnetewî û manaya rastîn a xwe li Turkiyê, dibe seba lezek pêtir a pêvajoya demokratîzasyonê di deverê de û rûçikek cîhanpesendtir dê bide Turkiyê.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**14.06.2011**
**24.03.1390**

## Sergotar

# Meha Pûşper, şînî yan berxwedan

**Kerîm Perwîzî**

Sibê meha Pûşper dest pê dike, guhertina demsalê û despêka Havînê li kultura kurdewarî de, herweha demsala germê û rakirina berhemê ye. Li dîroka xebata kurd de û ji nêrînek siyasî ve ger mirov mêzeyî meha Pûşperê dike, gelek bûyerên girîng di vê mehê de qewimîne. Li Îranê de jî mehek pir ji bûyerên siyasî û dîrokî ye. Di vê mehê de rejîmên serberedayî û dîktator ên desthilatdar li Îranê de gelek caran tawan afirandine û serkut û hovêtî kirine diyariya xelkê. Li meha Pûşper de xwendekar hatin tepeser kirin û sivikatî bi zanîngehê hat kirin. Li meha Pûşperê de jî rejîma taze bi desthilat gihîştî a Xomênî tawan û cinayet diafirand û xwe amade dikir ku li 28'ê Gelawêja 1357(1979)'an de êrîşî bike ser kurdistanê.

Lê ji hemû bûyerekê girîngtir û berçavtir, 22'ê Pûşpera 1368'an a rojî ye, ku desthilata tarîperest a Komara Îslamî, li serbajarê mosîqa û kelturî û rewşenbîriya Ewropayê (Viyenê), rêberê navdar û zanayê kurd, Dr. Qasimloyê nemir li ser maseya got û bêjê teror kir. Hemû salê ji wê demê pêve, Pûşper têkel bûye bi navê Qasimlo û yad û bîranîna Qasimlo li meha pûşper de li hizr û bawera kurdistan û kurdan de bûye bi meha teror kirina rojê.

Li meha Pûşper û li destpêka Havînê de, roja xwazayê bi tên û germiyek zêdetir ve hiltê û desthilatdarên Cemaranê, bose ji roja xebata siyasî û demokratîk û netewî a kurd danîn heya ku ber bi hilatina rojê bigrin.

Meha Pûşperê ew mehe ye ku tarîperest û dîktatoran, xwastin hêviya neteweyekê têde bikujin û cismê Dr.Qasimlo li Viyenê dane ber destrêjiya nifretê, û neteweya Kurd jî ji wê demê ve daxdar û xembarê wê ye ku teqe ji roja bîr û bawera wan hatiye kirin.

Lê berevajî xwasta dujminan, Dr. Qasimlo li yad û hizr û ramana gel nehat ramalîn û roja endîşeya wî pêtir, ronaktir û bitêntir ji herdem li Pûşperên hemû salekê de hil tê û meha Pûşper, neteweya Kurd û gelê Kurd li Kurdistana Îranê de, bi xebat û berxwedan û xweragirî û bi bîranîna rêberê navdare xwe nîşan dane û selimandine ku karwanê riya serbestiyê qet nakeve qedeman, û li ber ronahiya roja Pûşperê, riya xwe rijdtir û bi îradeyek qahîmtir û zêdetir ve dipîve. Dujminan xwastin meha Pûşperê bikin bi meha xem û nerihetiyê ji bo Kurdistanê, lê hogirên Dr.Qasimlo meha Pûşperê kirin bi nîşan û sembola xebat û xweragirî û berxwedanê.

# Endamekî PDK Îranê li herêma Urmiyê koça dawiyê kir

Roja Yekşemî 5'ê Hezîranê, Seyîd Mihemed Berzencî kurê şehîdê serbilind yê PDK Îranê seyîd Taha Berzencî di nexweşxaneyek bajarê Urmiyê de bi sedema nesaxiya penceşêrê di temenê 36 saliyê de koça dawiyê kir.
Seyîd Mihemed Berzencî sala 1354 a Rojî, di malbatek şoreşgêr û naskirî li gundê "Kanî Destar "ê (ser bi devera Mirgewera Urmiyê) ji dayîk bûye. Navbirî piştî şehîdbûna bavê xwe, weke endamek xebatkar yê PDK Îranê dest bi xebat û tekoşînê di pêxema bidestxistina armancên netewa Kurd kir û heya dawîn dema jiyana xwe weke endamek xebatkar dirêjî bi kar û çalakiyên berdewam da.

Termê şehîd Mihemd Berzencî, 5'ê Hezîranê di nava xulyaqetek zaf a xelkê devera Urmiyê de li goristana gundê "Kanî Destar"ê hat veşartin.



PDK Îranê bi vê boneyê, sersaxiya xwe ji malbat, kes û karên navbirî dike û xwe bi heval û beşdarê xema wan dizane.

Riha wî şad be.

www.arsivakurd.org

# Ber bi siberojek bi hêviya tavê (1)



Ebdulla Hicab

"Beriya demekê di nava arşîva hin nivîsên kevin de çavên min kete gotarekê ku roja 26.07.2000 min ji bo rojnameya "Özgür Politika" nivîsandibû û wergera wê ya Tirkî li Alman hatibû weşandin. Gotar basek kurt bû li ser diyardeya koçberiyê, hin bûyerên giringe ku karîgeriya wan li ser koçberiyê hebûye, koçberî li Kurdistanê, sedemên koçberiya Kurdan, Kurdên koçber kî ne û rol û karîgeriya koçberên Kurd di xebata rizgariya neteweyî de çiye. 11 sal bi ser nivîsê re derbas bûn, lê pirsgirêka penaberên ku bi hêviya jiyanek ewle ber bi Rojava bi rê dikevin û gelek ji wan nagehin armancên xwe her weke wê demê berdewame. Ji bo weşandina dubare ya heman babetê, lê ev car bi zimanê xwe yê esil, hin sererastkirinên nivîsandinê nebe min pêwîstî bi guherandinek bingehîn nedît. Renge ez şaş bim, lê weke her car dadwerê herî adil ji bo hilsengandinê hûn xwendewanên hêja ne", kerem kin:

Rêvîngên pêşerojek ji duhî xweştir bi hêviya siberojek ku carê tav nedîtiye pêl bi pêl bi rê dikevin û li ser riya qederê her car na carekê rastî çarenûsek reş tên. Bêparbûn ji îmkana beşdarîkirin di birêvebirina welatê xwe de, şer û metirsiya girtin, eşkence û kuştinê, bê hêvîtî û astengiyên jiyanê wan dikêşe ber bi aliyê momekê ve ku ji dûr ve hinekê ronahîyê nîşanî wan dide.

Bi hêvîya gehîştina bi moma rêgeşker, ew pir caran berê pê xwe nabînin û bi xemsarî pêgavan radikin. Lê dema ketin ser rê temaşe dikin ku li pêşiya her pêgavek nerakirî davikek tije strî heye ku her carê bi pê çend rêvîngan ve diale û komek mirovan, di gel hêviyên wan yên dûr û kederên wan yên kûr, bi xwe re dibe binê axê an nava kûrahiya deryayên bê bin. Ew penaxwaz kî ne, ji ber çi welatê xwe bi cî dihêlin û çi hêvî berê wan dide koçberiyê? Beriya bersiva wan pirsan, ev pirs tê serê mirov ka gelo çima koçberî? Kengê ew diyarde peyda bû?



Diyardeya koçberî û bi cîhêlana welatê xwe bi tenê taybetmendiya xelkê Kurdistanê nîne û ne tiştek nû ye jî. Ji koçberiya Kenaniyan ya berî 5000 salan re bigre heya ya Anglo-Saxonan (sakson) bo Ewrûpa di sedsala 5 de û hêriş û koçberiya Tirkan bo herêma me 1000 sal berî niha, dîrok pire ji nimûneyên koçberî û cîguhertinan. Lê koçberiyên dema nû hem ji ber sedemên cuda ne û hem encamên cuda hene. Xên ji şer û derxistina bi darê zorê, nebûna ewlekariyê û rewşa qeyranî, di qonaxek taybete gulvedana civakê de jî dema çavnihêriya xelkê zêde dibe û civak nikare bersiva wan daxwaziyan bide, gera li pey rêçareyek nû destpê dike.

Her di dîroka nû ya cîhana senetî (îndûstrî) de, hem ji ber sedemên siyasî û hem jî ji ber sedemên abûrî, bi miliyonan mirov ciyê jiyana xwe guherîne an bi mejbûrî riya xurbet û koçberyê girtine pêşiya xwe. Serbarî koçberiya bi mejbûrî, gelek koçberiyên dilxwaz jî di dîroka nû de çêbûne. Dewlemendiyên Afrîqa, xêr û bereketa ku li Amerîka heyî û ticareta li Asiya, gelek Ewrûpayî di dema xwe de kêşandin aliyê xwe ve. Pêvajoya cîgirbûn li Amerîka ku di sedsaliya 1600 û pê ve destpêkir, di her du sedsalên piştre, bi koçberya çend miliyon mirovên din re gîha qonaxek herî bilind û serî ji hemû koçberiyên dîroka mirovatiyê stand.

Di salên navbera 1870 heya 1915 de ji ber sedemên abûrî û siyasî - carna jî yên olî - bi miliyonan xelkê Ewrûpa berê xwe dan Amerîka, Canada, New Zealand û Australia û li wan deveran ji bo xwe wargehên nû ava kirin. Her du şerên Cîhanî (1914-19 û 1939-45) bi xwe re qedera bi dehan miliyon mirovan guhert û ciyê jiyana bi dehan milyon kesên din veguherî. Piştî şer gera li pey kar, reva ji dest astengiyên jiyanê û şerên nû yên dem bi deme herêmî, kêşe û netifaqiyên siyasî û bi giştî gera mirovan ya li pey pêşerojek bextewertir koçberî û cîgorkê kiriye beşek ji jiyana îroyîne mirovatiyê.

Cîbicîbûna mirovan û guherîna wargehan li Rojhilata Navîn û Kurdistanê jî, bi guherînên siyasiye li cîhana hevdem re reng û şêweyek taze bi xwe ve girt, lê pêvajo beriya avabûna dewletên nû destpê kiribû. Bi awayek giştî mirov dikare koçberiya xelkê Kurdistanê bi her du sedemên siyasî u civakî ve girê bide u wan ji hevudin cuda bike; Beşa yekê koçberiya ji ber sedemên siyasî, şer u rewşa Kurdistanê, ku bi xwe çendîn qonaxe u nivşa yekê ya koçberên Kurdistanî jî digre nava xwe.

Koçberên ku bi awayê komî ji ber sedemên siyasî, şer an jî bi zoreme bi dabeşbûna xaka Kurdistanê re (1514/1639 û 1923) heya piştî şerê cîhanî yê duyê (1945) u di qonaxên şerê rizgariya neteweyî li salên 60-90 li Êraqê, 1990-2000 li Turkiyê, rewşa aloze siyasî li salên 60 li Sûriye ji welat derketine, bi piranî bi darê zorê u bi komî hatine derxistin. Koçberiyên ji ber wan sedeman hem pêş sedsala 20 u hem di dema nû de karîgerî li ser cografiya mirovî (demografî) ya Kurdistanê jî daniye, bi awayekê ku li derveyî Kurdistanê, herêmên kurdî li Xurasan u Konya u civakên mezine Kurdî li Istanbul, Bexda, Beyrût, Şam, Tehran u gelek bajarên din ava kirine (her çend wargehên Kurdan li derveyî Kurdistanê beriya dabeşbûna welat jî di astek hinek sinûrdartir de ava bûbûn ).

Wê koçberiyê rewşa demografiye piraniya herêmên navbera gelê Kurd u welatê gelên cîran bi zerera Kurdan tev li hev kiriye, bajarên giring kirine mijara netifaqiya navbera gelan, herêmên kurdî li Başûrê Rojavayê Kurdisatnê kiriye 3 perçe u bo mînak hejmara Kurdên kurmancîaxêv li ser axa Rojhilata Kurdistanê daxistiye ser kêmtir ji 1/5 şêniya xwe ya bi koka xwe ji heremê.

Bi avabûna dewletên neteweyî li her çar welatên ku li ser Kurdistanê hukim dikin re, ji salên 1920ê ve xelkê Kurdistanê bi awayek sîstematîk bi diyardeya wargehguherîn û koçberiyê re rûbirû bû. Di salên navbera 1925 heya şerê Cîhaniye duyê (1939) siyaseta Riza Şah li Îranê û ya Mistefa Kemal li Tirkyê ew bû ku bela kurdên serhildêr ji serê xwe vekin.

Li gor planên stratêjîke her du dewletan hejmarek zor kurd ji Kurdistanê hatin dûr xistin û li deverên dine wan welatan, li dûrî Kurdistanê hatin bi cîh kirin. Kurdên ku li dervey Kurdistanê bûn, lê jiyana wan bi hevûdin re û li heremekê bû, bi piranî weke hevwelatiyên pile 2, destteng u bê deretan hatin hîştin. Kurdên ku ketibûne ser axa her du komarên Azerbaycan û Ermenistanê jî, ketin ber siyaseta koçberiya zoreme ya Stalin.

Ji salên 70 u piştre gulvedana xebata siyasî li Kurdistanê hin mirov neçar kirin ku welat bi cî bihêlin an ciyê jiyana xwe biguherin. Beşek ji wan kesan weke penaberên siyasî an weke kesên ku ji ber hegerên mirovahiyê weke penaber tên naskirin, li Ewrûpa û bi giştî li Rojava hatine vergirtin.

Beşa duyê ya koçberên ji Kurdistanê re koçberiya dilxwaz, an bi xwe hilbijartî ye ku ji ber hegerên abûrî û zêdebûna xulyaqet u şêniya welat serî hilda u pitir diyardeya wan 30-40 salên dawî ye. Gulvedana abûrîye welatên ku Kurd lê dijîn (heremên derveyî Kurdistanê) meydanek mezintir ji bo kar ji bo xebatkarên Kurd pêk anî. Pişt re derbasbûn ji wan welatan re bo Ewrûpa jî destpêkir.

Ev diyarde li destpêkê li Turkiyê peyda bû. Koçberên nivşa nû ew kesin ku ji bo kar diçin derveyî Kurdistanê u ew xebatkarên ku weke "mîvan" li Ewrûpa u li welatên dewlemend dixebitin u dijîn. Destpêka wê pêla koçberyê bi taybet ji bo Ewrûpa dizivire ser salên 60 dema ku ji nûve avakirina Ewrûpayê hêzek berfirehe kar dixwest. Di demek kurt de bi milyonan karker xasma ji Tirkiyê re berê xwe dane navendên kare Ewrûpa ku bi kêmî 1/5 wan ji Bakurê Kurdistanê bûn. Ji 1980 ê û pêve tek û tûk xebatkarên siyasî jî ku Bakurê Kurdistanê bi cî dihêlan ji wê komê zêde bûn.

Her çend yekem grûpa penaberên siyasiye kurd weke kom an grûpek berçav, piştî tevçûna şoreşa kurdî li sala 1975 li Başûrê Kurdistanê riya koçberyê girtin pêşiya xwe, penaberên siyasîye kurd weke grûpek xuya, ji salên 1980 û pêve li Ewrûpa zêde bûn. Ji 1980 û pêve heya dawiya dehsalên 90, gelek penaberên siyasî ji Başûr û Rojhilata Kurdistanê re riya Ewrûpa girtne ber xwe. Û di wan çend salên dawîn de jî bi komel gencên Başûrî riya koçberiyê girtine pêşiya xwe.

Sînûrê navbera nivşa yekê an ya pêşîne koçberên Kurdistanê u nivşa duyê dikare salên şerê duye Cîhanî be, ji ber ku pişt re rewşa Kurdistanê u mijara koçberiyê bi awayek din guherî. Berevajiyê nivşa yekê ya koçberên Kurdistanî ku wargehên nûye jiyana xwe weke memleketê xwe dihesibînin, nivşa nûye koçberên kurd çaveke xwe her li Kurdistanê ye û vegera welat ji bo xwe hem bi hesret dizane u hem bi armanc.

Gelo sedemên koçberya kurda di dema nû de çi ne û kî ne ku welatê xwe bi cî dihêlin?

Berdewamî di beşa tê de...

www.arsivakurd.org

# Qonaxa piraktîzekirina soz û peymanan



Selîm Zencîrî

Piştî midehek zaf ji çavnihêrî û heyecanan, serencam 24'mîn gera hilbijartina parlimanî a Turkiyê li 12'ê Hezîranê de birêve çû û bi vê çendê jî rûpelek nû ji dîroka siyasî a wî welatî hat vedan. Li hilbijartina vê carê de nizîkê 50 milyon kesan mafê dengdanê bi 7492 berbijaran li çarçoveya 15 hêz û aliyên siyasî û herweha 203 berbijarên serbixwe de hebûn ku ji bo bidestxistina 550 korsiyên parlemanê rikeberî û pêşbaziya hev dikirin. Ji vê hejmarê jî nizîkî %90 a xelkê, beşdarî hilbijartinê bûn û nûnerên dilxwaze xwe hilbijartin.

Hilbijartina vê carê li du waran de girîng û carenivîssaz bû:

Yekem: Serketina AKP'ê bi ser neteweperest, tundajo û statûkparêzên turk de. Bi wateyek din her wekî dihat çavnihêrîkirin partiya desthilatdar a AKP'ê, vê carê jî karî zorahiya korsiyên parlemanê (326) ji xwe re misoger bike û bo yekem car navê xwe li dîroka komara nû a vî welatî de ku kariye sê gerên hilbijartinê li dû hev de misoger bike û hikûmeta tekpartîtî pêk bîne, tomar bike.

Partiya han her çiqas ku bakgirawendek îslamî heye, lê li pey îslamîkirina welat ku ezmûnek dûr û dirêj ji sekolariyetê heye, nine û gor sîstemek nîvdemokratîk diçe pêş û kariye li gelek waran de bala hevwelatiyan bo aliyê xwe de rakişîne û him pêgeha xwe û him jî pêgeha Turkiyê jî qahîmtir bike.

Serketina AKP' li vê hilbijartinê bo çend xalên sereke vedigere:

-Bandor danan li ser hest û sozên ayînî û olî a hevwelatiyan bi sedema vê bakgirawenda îslamî a xwe ve ku piraniya wan musulman in

-Peyrewkirina siyasetek baş a aborî, geşandin û pûtedan bi bijîva jiyanê û tendorostiya hevwelatiyan, xizmetguzarî û kêmkirina asta bêkariyê

-Xistine ber tîxa operasiyonê a Yasaya Bingehîn ku berhema kûdeta û darbeya leşkirî a 12'ê îlona 1982'an e. Herweha dana soza amadekirina destûrek nû û serdemî ku xwedîka hemû deng û rengan be.

-Kêmrengkirina desthilat û heybeta dewleta kûr û sopayê li kar û barên siyasiye welat

-Girîngtir ji hemûyan jî, îtirafkirin bi pirsa kurd û hewlidan bo çareseriya wê ji riya aşitî ve, her çiqas ku gavên wê li derheqê de gelek xaw û rûyekî bûn. Lê belê dîsan jî karî armanca xwe bipîve û nifûzê bike nav kurdan û dengê zorahiya kurdan ji xwe re misoger bike.

Duyem: Serketina kurdan bi nîsbet hilbijartinên berê ve

Ger ji vê nêrînî û bi vê pîvanê ve




em mêze bikin, em dibînin ku kurdan vê carê serketinek baş bidest xistin û asta hişyariya siyasî û hesta netewî cudatir ji salên derbasbûyî geşe kiriye. Ji hêlek din ve jî ji ber baraj û bendawa %10'a hilbijartinê ku rêgir û asteng bû li hember hêzên kurdî de, li gavek kêm wêne û li bin alaya yekêtî û tebayî û hevxebatiyê de eniya ked, azadî û demokrasiyê pêk anîn û karîn 36 korsiyan bidest bixin. Her ew yekêtî jî bû hêvênê serketina wan û bihêz kirina pêgeha kurd û giranî xistine ser hewlên çareseriya pirsa kurd ji riya xebata siyasî, sivîl û parlemanî ve.

Lê eger em nifûsa kurdan li Turkiyê de bikin pîvan, li vê hilbijartinê de xincî şikest, bêhêvîtî û şermezariyê tiştek din namîne kurdan re.

Lê biher hal eva destpêka xebatek nû û siyasî ye bi arasteya pêşvebirina çerxa xebatê li vê para kurdistanê de û divêt bi hişyarî û lêzanîn ve bikar bînin.

Ya ku girîng û hewceyî baldanê ye, qonaxa piştî hilbijartinê ye ku hizba serketî û desthilatdar dê çiqas pabend be bi sozên xwe û çiqas dê gavên xwe qahîmtir bike bo encamdana reformên rastîn ên siyasî û darêtin û berhevkirina destûrek nû ku deng û reng û nûnerê hemû pêkhateyên netewî, etnîkî, mesebî û tex û qatên civakê pêka pîvanên navnetewî be? Partiya desthilatdar çiqas amade ye xwe vezelîne nav qada piraktîzekirina soz û peymanan û ji wan paşgez nebe? Heya çiqas amade ye ji bo stûgirtina vê berpirsatiya exlaqî û dîrokî û ...hwd?

Ger li vê derheqê de em gotinên Erdoxan li sêyemîn serketinê de bikin pîvan ku ragihand li pirosesa amadekirina destûra nû de penayê dê bibe ber her kes û aliyekê û dê hewil bide ku yasayek nû pêka pîvanên navnetewî û demokratîk cihgîr bike, eva mirov dikare geşbîn û çavnihêrê pêşerojek geş û pêşketina Turkiya li hemû warekê ve be.

Bi taybetî ku xewn û pilanên Erdoxan bo guherandina sîstema birêveberiya welat ji sîstema serokwerzîriyê ve bo serokatiya welat û herweha avakirina Turkiyeyek modern li yad û bîranîna 100 saliya xwe li sala 2023'an de bi cî tê û ji vê riyê ve jî dikare bi armanca du devre serokatîkirina welat bigihîje û Turkiyayê jî bike endam li YE'ê de ku çendîn sal e hewlê jêre dide.

Lê niha asteng û pirsgirêkek li ser riya AKP'ê heye. Ew jî bona derbaskirin û pejrandina destûra nû diviya AKP'ê 367 korsî misoger bikirana ku têde bi ser neket. Riyek din jî heye ku diviya 330 korsî bidest bixistiban ku bikarîba ji parlementoyê derbas bike û bixe ber referandomê, ku li vê yekê de jî korsiyên hewce bidest nexistin û niha 5 korsî kêm hene.

Lewma tenê riyek jêre dimîne ew jî nizîkatî û pêkanîna hevalbendiyê bi aliyên opozîsyonê re ye li Parlementoyê de. Helbet bi baldan bi derbasbûyî, hizrîn û dijberiya AKP'ê û her du partiyên komarî û neteweperest re, hevalbendiya han zehmet tê dîtin.Lewma take riya ku jêre dimîne Kurd in, ku bi xwe jî goriyên vê destûra biyom in, û AKP dikare vê vebijrkê hilbijêre. Helbet bi mercekê ku tu şûnwarekê ji siyaseta şovenîstane û paremayî a yek zimanî, yek alayî, yek netewî û yek dewletî li destûra nû de nehêle.



## Hêzên Qezafî li şer de destdirêjiya cinsî dikin ser girtiyan



Hêlarî Kilînton, Wezîra karûbarên derve a DYA'ê hêzên Qezafî rêberê Lîbiyê bi mifahwergirtina ji destdirêjiya cînsî tawanbar kir.

Kilîntonê eşkere kir ku hine deshilatdar li welatên Rojhilata Navîn û bakûra Afrîqayê de tundûtîjiya cînsî bi dijî jinan li berbirûbûna bi neyarên xwe û tevgerên azadîxwazane bi kar tînin.

Hêlarî kilînton di daxûyaniyekê de herweha ragehand ku DYA'ê derheq ew raporên ku li ser destdirêjiya zayendeyî bo ser jinên Lîbiyê û herweha li herêmên din ên Rojhilata Navîn û bakûra Afrîqayê bilav dibin, nîgeraniya xwe eşkere kir.

Di vê daxûyaniyê de herweha hatiye gotin ku dadgeha cenayî ya navnetewî hinek lêkolîn li derbarê mifahwergirtina sîstematîk ji destdirêjiya cînsî ji aliyê hêzên Qezafî ve dest pê kiriye.

## Mahir Esed li ser cînayetan berdewam e

**Artêşa Sûriyê bi serokatiya Mahîr El Esed, bi tank, Helîkopter û bi hezaran leşkerî derbasî Cisr Şixûr û gundên wê bû.**

Televîzyona Sûriyê ya fermî ragihand ku operasyon li dijî wan çekdaran bû ku 120 polîs kuştibûn. Lê Ajansên Navnetewî ragihandin ku hêzên Sûriyê 48 kesên sîvîl kuştin. Rêxistina Heyva Sor jî îdia kir ku artêşa bi serokatiya Mahîr El Esed, bi sedan kes ji xelkê sîvîl ên gundên devera Cisr Şixûr kuştin. Piştî wan êrîşan bi hezaran kesî ji tirsê hêzên hikûmetî xwe derbasî aliyê din ê sînor kirin û niha wek aware li xîvetan de dijîn.



www.arsivakurd.org

# Di nakokiyên bê dawî de kî ser dikeve?

Rûken

Dema ku Ehmedînijad di sala 1384'an de hate ser kar, her di destpêkê de Saziya Bername û Budcê hilweşand. Vî çaxî gellek ji kesayetiyên siyasî heta di nav alîgirên vî bixwe de jî, bi tundî navbirî rexne kirin, lê navbirî di bersiva rexnegiran de digot ku ew saziya li sala 1328'an de, ji aliyê Amrîkayiyan ve hatiye çêkirin, lewra divêt ku wê demê berjewendiya Amerîkayiyan têde hebe, û armnaca wan pêşîgirtin ji geşekirina welat û jinavbirina aboriya welat bûye.



Di rastî de piştî axavtinên Ehmedînijad derheq Saziya Bername û budceyê, ne tenê tu girup, tevger, sazî û rêkxistinekê saziya Bername û Budceyê bi îxanetê û girêdayîbûna bi Amerîkayiyan tawanbar nekir, heta piştî şoreşa gelên Îranê jî Mohendis Moînfer hate ser kar, ku kesekî gellek mesebî jî bû. Renge Ehmedînijad Moînfer û hevalên wî wek kesên lîberal û ser bi Amerîkayiyan bizane, lê kesên din ku hatin ser kar û dijî Amerîkayî jî bûn tu rojan negotin ku Saziya bername û Budceyê ser bi Amerîkayiyan e, û pêşiya geşekirina Îranê di warê aborî de girtiye, û divêt were hiloşandin.

Di rastî de ne ew sazî Amerîkayî bû, ne jî vê saziyê bepirsatiya birêvebirina projeyên Amerîkayiyan di vî welatî de li stûya bû. Belkû ew sazî rêkxistinek modern bû ku hejmarek ji karnasên herî jêhatî di warê bernamerêjî, budcenûsî û abûriyê di nav xwe de cih da.

Serokê dawiyê yê vê saziyê Dr. Ferhad Rehber bû, ku bixwe jî kesekî aborîzan bû, û dewleta Ehmedînijad her di destpêka karê wî de, di gel wî kêşe hebû. Di rastî de tevahiya hewla Ehmedînijad eva bû ku vê saziyê jî bixe jêr desthelata xwe de.

Piştre Ehmedînijad bona nîşandana hêz û deshilata xwe, wezîrê Îtilaatê wate "Muhsniyê Êjêî" û " Sefar Hirendî" wezîrê Çand û Geşeya Îslamî li ser kar rakirin û xwest ku biselimîne serkomarî posta herî bihêz a birêveberiya welat e.

Lê dijkiryarên Xamineyî li hemberî helwestên navbirî li qonaxên cur bi cur de, selimand ku dijberîkirina şexsê rêber li nizama îdeolojîk a Îranê de hekî mehal jî nebe, buhyek qurs û giran dixwaze.

Her weha heyamekî berî niha bû ku Ehmedînijad biryara li ser kar vêdeçûna wezîrê Îtilaatê yê niha wate " Hêyder Muslihî" qebûl kir, û bi vî awayî dixwast bi hilgirtina "Wezata Îtilaatê" û danîna "nîhada Îtilaatê" di cihê wê de, wezareta Îtilaatê jî bi tewahî bixe jêr deshilata xw de, lê me dît ku Xamineyî vê carê bi tundî destêwerdan li vê pirsê de kir û nehêla ku Moslihî dest ji karê xwe berde. Xamineyî berî vê jî li ser biryara li ser kar rakirina Mutekî wezîrê karê derve jî, hişdariyên tund dabûne Ehmedînijad, ku piyê xwe ji rayêxa xwe zêdetir dirêj neke.

Ehmedînijad piştî wan kêşeyan niha pirojeyek din dest pêkiriye ku ew jî projeya kêmkirina wezaretxaneyan e, ku li navxwe û derve neyarên vê pirojeyê ne kêm in.

Şer û kêşeya li ser têkelkirina wezaretxaneyan niha bûye beşek ji pirsa nakokiya di navbera parlemento û serkomariyê. Heyamekê berî niha beşek ji nûnerên parlementoyê pêşniyar kiribûn ku li gorî wan cudahiya bîrûrayan ku di navbera parlemento û dewletê de li ser yasaya têkelkirina wezaretxaneyan heye, carê ew têkelkirina wezaretxaneyan bimîne bo demek din, û biryardan di vî warî de bimîne piştî hilbijartinek din a serkomariyê.

Cîgirê serkomar yê parlemanî jî, di vê derbarê de gotiye ku "Dewletê li gorî bernameya pêncemîn a geşepêdanê ew biryar daye, û hekî nûnerên parlemanê bixwazin ku vê biryarê ret bikin, divêt sebebên mentiqî jêre hebin".

Dewlet li gorî bernameya pêncemîn a geşepêdanê di warê kêmkirina wezaretxaneyan ji 22 wezaretxaneyan ve bo 17 wezaretxaneyan, têkelkirina çend wezaretxaneyan û pêkanîna wezaretxaneyên nû, li ser bingeha pejirandiya kabîneya wezîran ragehand, û heta ji wan wezaretxaneyan re wezîr û serperest jî dîyarî kirin.

Di encamê de ew kêşe birin bo Şêvra Nobedariyê (Şorayê Nigehban), wek çavkaniya şirovekirina Yasaya Bingehîn, û di daviyê de raya parlementoyê hate pesendkirin. Berpirsê vê şêvrê ragehand ku he cure guherînkarî di wezaretxaneyan de divêt ji aliyê nûnerên parlementoyê ve jî bihê pesendkirin, û piştî vê wezîrên pêşniyarî jî divêt dengê hitbar û baweriyê ji parlementoyê wergirin.

Şer û kêşeya di navbera dewlet û parlementoyê de, wê demê tund bû ku nakokiya di navbera Xamineyî û Ehmedînijad li ser rakirin û danîna berpirsyaran bû sedema vê ku hinek ji alîgirên Ehmedînijad bikevin ber êrîşa herî tund ya baskê mohafizekare rejîmê.

Ew şer û kêşe gihîştiye astekê ku niha alîgirên Ehmedînijad ji aliyê rexnegirên ji Ehmedînijad ve, wek "revta ji rê derketî" tên binav kirin.

Damezrandin, guhertin û têkelkirina wezaretxaneyan di nizama Komara Îslamî a Îranê de vedigere bo dewletên curbicur. Kabîneya Benîsedr bi 18 wezaretxaneyan û ya Bazirgan bi 19 wezaretxaneyan hate avakirin, di kabîneya dewleta Recayî de sê wezaretxane û di kabîneya dewleta Musewî de wezaretxaneyek hatibû zêdekirin.

Di dema serkomariya Refsencanî de du wezaretxaneyên Sipah û Pîşesaziya Qurs (Senayi' Sengîn) hatin rakirin. Dewleta Xatemî jî di çar salên destpêkê de wezareta "Teawon" bi kabînê ve zêde kir û wezaretxanên "sazendigî" û "Meadin"'ê rakirin, û di dewreya din ya kabîneya xwe de wezareta "Rifah"ê ava kir. Behsa biçuk kirina dewletê û geşepêdana beşa taybetî ji dema birêvebirina bernameya sêyemîn a geşepêdanê di Îranê de kete ber bas, ew biryar di destpêkê de ji aliyê karnasên warê aboriyê ve wek yek ji riyên jêhelbirina asta kêrhatîbûnê û kêmkirina para dewletê di aboriyê de, bû ciyê behs û gengeşeyan.

Li gorî bernameya pêncemîn a geşepêdanê hejmara wezaretxaneyan ji 21'an bo 17 wezaretxaneyan divêt were kêmkirin. Karnas li gorî para 80% ya dewletê di aboriya Îranê de, li ser vê bawerê ne ku dewlet bi kêmkirina wezaretxaneyan biçuk nabe û nikar armancên xwe bipêke. Ew li ser vê bawrê ne ku dewlet wê demê dê biçuk be ku berpirsyarên dewletî amade bin ku bazineya biryardanan sînordartir bikin.


## Amerîka li Kendawê binkeya esmanî ava dike

Firanspres ê ragihand ku Amerîka mijûlî avakirina paygehek esmanî a veşartî li Kendawa Fars e ji bo mifahsitandina saziya C.I.A, ku tê gotin şervanên Amerîkî niha pêda oparasyonên xwe ên dijî terorê li Yemenê ji vê riyê ve birêve dibin.

Armanca Amerîkayê ji avakirina vê binkeyê, tirs ji bi desthilatgihîştina dijî Amerîkayiyê li Yemenê ye.

Eva di halekê de ye ku dewleta Yemenê di sala 2009'na de îzna kumandoyên Amerîkî dabû ku ji bo xebat li dijî terorîzmê ji axa wî welatî mifahê werbigrin. Heyamek piştre, dewleta Yemenê rezamendiya xwe li hember firîna balafirên bêpîlot li dijî Elqaîde li esmanê Yemenê nîşan da. Li gor nûçegihaniya Firansayê, dema diyarîkirî a avabûn û destbikarbûna vê payîgehê piştî kirîzên siyasî ên Yemenê hatiye guherîn, dema han ji 2 salan ve bo 8 mehan hatiye kêmkirin û di van 8 mehane de gerek payîgeha han bihê avakikrin.

Hêj nehatiye zanîn ku ev payîgeh di kîjan welatê Kendawa Fars de ye û Firanspres ê jî ragihand ku seba pirsên ewlehî, xwe ji anîna navê çavkaniya vî nûçeyî parastiye.




www.arsivakurd.org

# Lîderê Kurd pîlan jêre hate darêtin



Şehab Xalidî

Simayîl axa kurê Mihemed axa naskirî bi Simko Şikak piştî şerê yekemîn ê cîhanî karî beşek ji xaka Kurdistanê ya Îranê li jêr deshilata hikumeta navendî a Îranê rizgar bike û di hemberî hêzên dewleta navendî ya Îranê de bergirî ji xak û nîştimana xwe ya dagirkirî bike.

Navbirî di nameyekî de bo hukimranê Azerbaycanê dinivîse: " Çawa ye ku neteweyên biçuk ên cîhanê ku nifûsa wan nabe yek li ser çarê ya Kurdan, ji hikumetên mezin ên cîhanê otonomî wergirtine? Hekî neteweya mezin ya Kurd nekare mafê xwe ji deshilatdariya Îranê wergire, bêhtir ev e ku bimre û zindî nemîne, hikûmeta Farsan çi bixwaze yan nexwaze kurdistan dê otonomiya xwe bi dest bixe, lewra gorîkirina canê mirovan karekî bê çine ye". ( L 70, Tevgerên netewî yên Kurdan).

Deqê vê nameyê bi başî eşkere dike ku bîra azdîxwaziyê û bergirî ji xaka Kurdistanê armanca sereke ya şoreşa Simkoyê Şikak bûye, lewra Simko nikare şahidê gehîştina gellek ji neteweyên biçuk bi mafên xwe ên netewî be, di demekê de ku ne tenê her mafên herî destpêkî jî ji Kurdan re bi rerwa nizanin, belkû bi awayekî herî hovane tên kuştin.

Herweha di demekê de ku deshilatdaran bo dagirkirina Kurdistanê berdewam hêz dişandin Kurdistanê, û rijandina xwîna mirovan di pêxema deshilata wan de tu bihgiraniyek tunebû, navbirî di nameya xw de rijandina xwîna mirovan wek karekî bê feyde dizanî û daxwaza mafê rewa yê Kurdan û aştiyekî cihgir dikir.

Navbirî di bersiva nameyekî Mistefa Paşa nûnerê Kurdên Turkiyê de, ku jê pirs dike, we tu rêkxistinek tune ye, hûn çawan dixwazin herêmên jêr deshilata xwe birêve bibin, dinivîse: "Rast e ku me rêkxistinek serûber tune ye û ez jî tenê kesek im, lê giring ji me re rizgarkirina Kurdistanê ye, lê eva ku çi kesek Kursdistanê birêve bibe, di pileya duyemîn a girîngiyê de cih digre". (Tevgerên netewî ên Kurdan).

Li gorî wan axavtinên Simko em dikarin bêjin ku rizgarkirina nîştiman ji bo vî rêberê şoreşvan (Ev jî di serdemekî de ku deshilatdaran berî her tiştî bîr ji qebzekirina deshilatê di destê xwe de dikirin) ji her pile û payeyekê sertir bûye, lewra navbirî eva ku kî hikûmetê birêve bibe, di pileya duyemîn de dadinê.

Xalekî giring ku di vir de divêt bas jê bihê kirin, eva ye berevajiyê hinek ji kesayetiyên Kurd ên vî serdemî ku her şêwepêwendiyek bi Birîtanya û welatên din re bi dijî buhagiraniyên çandî û olî dihesêbandin, lê Simko vî çaxî ji bo destveanîna mafê rewa yê Kurdan, Şêx Taha Şemzînî şande Bexdayê, bona vê ku daxwaza alîkariyê ji nûnerê Birîtanyayê bike ku bersiva erênî jî wergirt û ew alîkarî sê mehan dom kir.

Di rastî de her ew jêhatîbûn û pêdagirbûna navbirî li ser daxwazên xwe ên rewa, bû sedema vê ku deshilatdarên vî çaxî ên Îranê bona jinavbirina navbirî pîlanan darêjin, her



çend ku wan ew lîderê cesûr û jêhatî şahîd kirin, lê qet nekarîn neteweya Kurd ji şoreş û xebatê dilsar û bêhêvî bikin. Hekî wan stêrkek geş ya esmanê kurdan vemirandin, lê her di vê salê de rojek pirr tîrêj, di esmanê tarî yê Kurdistanê de bi dijî tarîtiyê derket, ku çiruska wan tîrêjan esmanê Kurdistanê ronahî kir û gişt xewn û xeyalên dujminên Kurdan pûç û bê bingeh kirin.

# Kirîza Sûriyê dikare navbera

## Tehran û Enqerê sar bike

Rikeberiya Îranê û Tirkiyê bona vê ku bibne hêzek mezin di herêmê de, bi alozbûna rewşa Sûriyê ketiye nava qonaxekê nû de, ew jî di demekê de ku Enqerê dest bi rexnegirtina ji rejîma Beşar Esed di warê tepeseriyan de kiriye, lê rejîma Îranê bi hemû awayekî piştevaniya rejîma Sûrye dike.

Li gorî nirxandina gellek ji karnasan di herêmê de, Turkiye ji pêvajoya gotûbêjan bona tevlîbûna bi YE'ê re gellek nerazî ye û heyamek e ku ketiye nava hewildanan de, da ku bi dîplomasiyeke gellek çalak cî piyê xwe zêdetir ji berê di nava cînaran û welatên herêma Rojhilata Navîn de qahîm bike.

Turkiyê di wan salên borî de her tim hewil daye ku xwe wek xwedîzêrê demokrasiyê di herêmê de nîşan bide û ji welatên Misilman re bibe mînak.

Hinek ji karnasan liser vê baweriyê ne ku Turkiye bi awayek ecêb dixwaze ji welatên rojavayî dûr bikeve. Siyaseta tevlîbûna bi YE'ê re siyasetek bû ku ji aliyê bijardeyên modern ên bajarî ve dihate şopandin, lê di dema deshilatdariya Erdoxan de hêdî- hêdî giraniya deshilatê ji destê bijardeyên bajarî ve dikeve destê hêzên Îslamî ên kevneşop de ku di koka xwe de gundî ne.

Gotûbêj bona tevlîbûna bi YE'ê re, ji ala 2005'an pêve û bi nerazîbûnek berbiçav ya Turkiyê diçe pêş. Lê Turkiye di hember de li hizra destpêregihîştina bi lihevhatinekê bona pêkanîna herêma tîcareta azad bi welatên wek Ordon, lubnan, Sûriye û Îraqê re bûye.

Turkiye heya niha jî îdia dike ku bi cîranên xwe re tu kêşe û arîşeyek tune ye, lê li gorî gotina hinek ji çavdêran bûyerên van daviyane di



Sûriyê de dikare Turkiyê neçar bike ku pêdaçûnekê bi ser siyaseta derekî ya xwe de bike. Bi destpêkirina tepeseriya berfireh ya neyaran di Sûriyê de Turkiyê sînorên xwe bi rûyê koçberên Sûriyê de vekir. Di wan rojên borî de bi sedan kesî rû li sînorên Turkiyê kirin û ji tirsê canê xwe, xwe gehandin xaka Turkiyê.

Alozî û kêşeyek taybetî

Ji aliyekî din ve tundtirbûna kirîza siyasî di Sûriyê de, bandora xwe li ser têkilyên di navbera Îran û Turkiyê de jî heye, jiber ku her du welat bi hevre li ser zêdekirina nifûza xwe di Sûriyê de rikeberiyê dikin. Sûriye hevalbendê Îranê yê dirêjheyam e.

Di demekê de ku Turkiye bi awayekî eşkere rexneyan ji rejîama Beşar Esed digre û daxwazê ji wan dike ku reforman di welatê xwe de pêk bînin, lê rejîma Îranê ji siyaseta tepeseriyê a rejîma Beşar Esed piştevaniyê dike.

Semîh îdyiz karnasê siyaseta derekî ya rojnameya "Miliyet" li ser vê bawerê ye ku kirîza di Sûriyê de dikare navbera Îran û Turkiyê sar bike. Navbirî dibêje ku tewaya siyaseta Turkiyê bona nêzîkatiya bi Sûriyê re di gel têkşikanê berbirû bûye, û Turkiye neçar e ku li siyaseta xwe ya di Rojhilata Navîn de pêdaçûnê bike.

Li gorî çavkaniyên dîplomatîk di van rojên daviyê de çend welatên Ewropayî daxwaz ji Turkiyê kjirin ku ji giraniya xwe bona bandordanîna li ser rewşa Sûriyê mifahê wergire.

Turkiyê pêştir jî hewil da ku li ser projeya navikî a Îranê rolekî navbeynkarane bilîze. Hewlên daviyê di vî warî de, vedigere bo sala borî ku bi awayekî hevbeş di gel Birizîlê hewil dan ku kêşeya li ser projeya navikî a Îranê çareer bikin.

Lê hejmarek ji karnasan jî bi awayekî reşbînane li rolê Turkiyê dinêrin. Di civînên dîplomatîk ên YE'ê de tê gotin ku bi baldan bi krîza Sûriyê siyaseta Turkiyê derheq "nebûna tu arîşeyan bi welatên cîran re" bi awayekî eşkere bi têkşikanê re berbirû bûye. Hinek ji welatên Ewropayî heta rexneyan di vê derbarê de li Turkiyê digrin ku Turkiyê bi hewildanên xwe rejîma Beşar Esed di asta cîhanî de wek rejîmeke ciyê qebûlkirinê daye naskirin, lewra tawanbar e. Li ser vê bingehê tê gotin ku siyaseta "mista polayîn" ya Esed di warê tepeseriya neyaran de zêdetir ji hemiyan bo rêberên Turkiyê ciyê nîgeraniyê ye.

Çavkanî: **Radyoya Alman**

www.arsivakurdi.org

## Rêzdar Mistefa Hicrî di civîna Kurdên Alman de beşdarî kir



Roja şemiyê, 18'ê Hezîranê, li ser gaziya çend kesayetiyên siyasî yên Kurd li welatê Alman, rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ di civîneke siyasî de beşdarî kir. Nûçegihaniya Kurdistanê: Di civîneke de ku li Kolna Alman de birêve çû, Mistefa Hicrî guhê xwe da bîr û boçûnên beşdaran derheq siyaset û helwestên PDKÎ di warê bûyerên siyasî ên Kurdistan û cîhan û Rojhilata Navîn, girt.

Koma boçûn, pirsiyar û dîtingehên beşdarên civînê bi vî awayî bû:

-Rewşa tevgera Kurd di Îranê de

-Siyaseta PDKÎ derheq tevgera "Kesk"

-Pêwendiyên di navbera partiyên Îranî û Kurdistanî

-Eniya Kurdistanî

-Tirsa nakokiya navbera partiyên Kurdistanî

-Encama sefera rêzdar Mistefa Hicrî bo derveyî welat

Piştî bi dawîhatina vê beşê ji civînê, Sekreterê Giştî yê PDKÎ, siyaseta partiyê derheq rewşa niha ya Kurdistan, Îran û cîhanê ji beşdarên vê civana siyasî re şirove kir û bersiva pirsiyarên beşdaran da. Civîna di gel beşek ji endamên PDKÎ û guhertina bîr û rayan derheq rewşa Komîteya vê partiyê di warê rêkxistinî û dîplomasî de beşeke din ji bernameya sefera Sekreterê Giştî yê PDKÎ bo welatê Alman bû.

## Nûçegihanek taybet yê mafê mirov bo Îranê hat diyarîkirin



**Ehmed Şehîd, Wezîrê Kar û Barên derve yê berê yê Maldîvê weke nûçegihanek taybetî bi mafê mirov bo Îranê hat diyarîkirin.**

Eva yekemîn car e ku şêvra Mafê Mirovan ya NY, ku li sala 2006'an de hatiye avakirin, nûçegihanek taybetî bo welatek bişîne. Erkê sereke yê wî nûçegihanî lêkolîn di warê binpêkirina mafê mirov ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve li Îranê de ye. Ehmed Şehîd divê bi seredanên xwe bi Îranê û pêwendîgirtin tevî organên hikûmetî û xweser, rewşa mafê mirov li Îranê binirxîne. Lê hêj ne diyar e ku rayedarên Komara Îslamî dê wî bipejirînin yan na.

Rojev

# Ew ciyê ku mirî jî bi tehlûke ne

W: Arîn

Meha borî li dawî hevdîtina girûpa heşt li Feransayê de, rêberên cîhanê dîtin ku Buhara Ereb li Îranê de jî, dest pê kiriye. Ew rast difikirîn; serhildanên îro ên Rojhilata Navîn ji meha Havîna sala 2009'an de, bi mirina Nida Axa Soltan bi derba gulleyan li Tehranê de dest pê kir. Dema ku wê bi çavên vekirî rih da, bi milyonan kesî ketin nava kolanan û piştî dexelkariyên di hilbijartina serkomariyê li meha Hezîranê de daxwaza guhertina li rewşa heyî, yan jî guhertina hikumetê kirin. Demokrasiyên parlemanî û Amrîkayî ji meşvanan tu piştevaniyek weha berbiçav nekirin.

Tevî vê ku Buhara li jêr pêstê Îranê de gellek caran bi awayê herî hovane hate tepeser kirin, lê azadîxwazên Îranê ji xwe berxwedaniyek bê mînak nîşan dan. Kuştina Nidayê, li ser îzna hikumetê, kuştarên li pey xwe re hebûn. Rast her di vê mehê de me dît ku Halê Sehabî di rê û resma bi axêspartina bavê xwe de kete ber êrîşa hêzên kincşexsî ên rejîma Îranê û canê xwe ji dest da.

Bavê wê Izetullah Sehabî ji nûnerên pêşîn ên parlementoya Îranê û ji kesayetiyên naskirî ên dijberî nizama vî çaxî a Îranê bû, ku li wan rojên daviyê de bi egera xwînrêjiya mejî canê xwe ji dest da. Gellek ji meşvanan li rê û resma sersaxiyê ya Halê Sehabî de beşdarî kirin ku dîsan hêzên hikumetî êrîşî ser wan kirin û gellek ji wan girtin.

Kesên weha jî hene ku piştî berbirûbûna bi Komara Îslamî re zindî mane. Seîd pûr Hêyder reformxwaz û girtiyê pêşîn ê siyasî ku bi wan zukatiya ji Îranê derketiye, li gotûbêja vê dawiyê ya xwe de, di gel kempeyna navnetewî ya mafê mirovan li Îranê de, bi baskirina jiyana di nav girtîgehên rejîma Îranê de dîmenên ecêb raxistin berçavan.

Pûr Heyderî dibêje ku serjêrkirina girtiyan, avêtina wan di nav ava cemedê de, lêdana bi qamçiyan, û gihûşîna beyziyên girtiyan, beşek ji riftara wan di gel girtiyan e. Îdam û destdirêjî û gefkirina li keç û jinên girtiyan, ji qaydeyên sadîsmî ên girtîgehê ne.

Hovîtiya hikûmeta Îranê piştî yekemîn meşa xelkî li sala 2009'an de geş bû, lê



riftarek bi vî awayî ji bo peyrewên mesebê Behayî ne tiştekî nû ye. Komara Îslamî a Îranê li hemberî wan de ji sala 1979'an pêde bi destpêkirina şoreşa Îslamî, siyaseta êrîşê berdewam kir, Behayî ji çûna bo xwendegehên curbi cur û bi taybetî zanîngehan bê par in. Di meha çûyî de 30 kes ji wan bi tawana beşdariya li polên Anlayn ên Damezraweyên Xwandina Tewaw de hatin destbiser kirin.

Serkomarê Amrîka Obama û Angela Merkil, heftiya borî di civînekê de îşare bi nîgeraniya gellek micid a xwe di derbarê projeya navikî a Îranê de kirin. Baş e ku em dibînin zordariyên rejîma Îranê, di yad û bîra rêberên demokrat û xelkserwer de dimîne, lê ew tenê têrê nake. Hikûmeta ku têde keç nikare li rê û resma bi axêspartina bavê xwe de beşdariyê bike û ew kesê mirî, piştî mirinê jî, ji aliyê deshilatê ve wek kesekî ciyê tirsê û bi tehlûke tê hesêbandin, nikare hikûmetek be ku mirov li ser pirsên wek desthilgirtina ji çeka navikî bi awayekî mentiqî pêre bikeve nav gotûbêjan de.

Heya wê demê ku Îran rûyê azadiyê bi xwe ve nebîne, cîhan jî rûyê aramî û ewlehiyê bi xwe ve nabîne, û rojava nabe tenê li bazineya mafê mirovan de bi Îranê re gotûbêjan bike.

Obama û Mêrkil gotin ku ew li benda rapora vê heftiyê ya Ajansa Navnetewî ya Têhna Navikî ne, û piştre bi awayek micid dê bikevin nava hewildanan de. Di rastî de gellek zehmet û dilêş e ku Obama û Mêrkil mirina Halê Sehabî bo berçavgirtina helwêstên micid bes nabînin.

Çavkanî: Wall street journal







www.arsivakurdi.org

# Diyardeya penaberiyê, berhema pêkhateyên siyasî yên nedemokratîk e



Sadiq Vehdanî

Penaberî diyardeyekî dîrokî ye ku rîşala vê tirajidiyê ji hegerên siyasî, olî, regezî û netewî ve çavkanî digre. Awarebûna Yehûdiyan di dirêjahiya 2 hezar salên derbasbûyî de, revîna 15 Hezar Pêrewên meseba Pirotistên Firansayê bo welatê Almaniya di serdema sedsalên navîn li Ewrûpayê, cînosayda Ermeniyan ji aliyê hikûmeta Usmaniyan ve ku bû sedema koçberbûna pêtir ji 600 Hezar Ermeniyan, herweha revîna zêdetir ji Yek Milyon kes piştî guhertinên Rûsiya li Octobera 1917, hin ji mînakên penaberî li dirêjahiya dîrokê de ne. Piştî şerê cîhanî yê duyem û awarebûna çendîn Milyon kes li Ewrûpayê û piştî pêkhatina Saziya "NY", Komîsariyaya Bilind a Penaberan bi mebesta pêkanîna tenahiya penaberan û cîbicîkirina mafên diyarîkirî ên wan di carnameya cîhanî a Mafê Mirov de, pêk hat.

Rûyên mandî û nîgeran ên kesên ku li ber balyozxaneyan, şêk û guman û dilkutik di warê rewşa pêşeroja xwe, jiyan li kempên penaberan, nexweşî û feqr, rewşek e ku di nav beşek ji xelkê cîhanê bi sedema ne îdaletî û neçarbûn pêk hatiye. Ev yek li edebiyata hiqûqî û siyasî de "penaberî" tê pênasekirin.

Koç û penaberî du mijarên ku di warê hiqûqî de cuda ji hevdu ne, lê sedem û esliyeta wan diyardeyan yek in. Wate her kesek bi sedema rewşa xirab a jiyana xwe bo welatek din aware û penaber dibe.

Welatên cîhana sêyemîn bi hegera ne demokratîkbûn û berhema "îstêimar"ê ku li stayla sînordanîna welatan de xûya ye, tûşî şer bi awayên cur bi cur bûne. Sînorên siyasî bi bê berçavgirtina rewşên çandî, olî, netewî û şaşitî li sîstema netewesazî li wan welatan de, paradoksên kûr di warên cur bi cur de çê kiriye, ew paradoks bûye sedema desthilatdariya desteyek taybetî û tebeqeyek ji civakê bi ser hemû xelkê welatê de, ku bê guman nûnerê hemû xelkê welatek ninin. Nedemokratîkbûna wan welatan jî tu hizrînek xincî hizrîna desthilatê pesend nake û bi tunebûna derfet di warê siyasî û abûrî a kesên dijber yan kesên ku nikarin xwe li çarçoveya rewşa han cih bidin, ew kes neçarin ku welat û warê xwe biterkînin û bo jiyanek baştir bo welatek din penaber bin.

Cureyên muhaciret û penaberî li welatên Rojhilata Navîn û Afrîqayî li gel welatên pêşketî ên Ewrûpayî û Amerîka cuda ne. Penaberî li wan herêman bi sedema nebûna îmkana sefer bo welatên pêşketî û qebûlnekirina hemû kesî weke penaber, ji aliyê hikûmetên welatên pêşketî ve, pêtir bi awayek herêmî ne, herweha penaberên han weke hêzên ne pispor û bi awayê berfireh û desteyên mezin ên mirovî, tê encam dan, wate koçek bi kom bo welatên cînar, weke penaberbûna Efxanan bo welatê Pakistanê piştî şerên navxweyî yê wî welatî, yan penaberbûna bi kom a xelkê Felestînê li welatên Mîsr û Lobnanê.

Koç û penaberî bi vî awayî bi qazanca tu yek ji welatên "Mebdei" û "Meqsed" nine ji ber ku derketina sermayeyên mirovî ji welatekê weke derketina hêzek mirovî û sermayeyek civakî tê hesibandin û herweha welatên "Meqsed" jî ku neçar dibin hewcehiyên jiyana penaberan cî bi cî bike. Lê welatên pêşketî bi sedema demokratîkbûn û tunebûna pirsgirêkên olî û netewî û hebûna derfetê bo jiyanek baş bo her kesek li wan welatan de, pirr kêm kes hene ku xwaziyarê penaberî bo welatek din bin, herweha qebûlkirina penaberan ji aliyê welatên pêşketî ve bi awayê tak e û zêdetir wan kesan dipejirîne ku di warekî taybetî de pispor bin.





Îran bi desthilatdariya hikûmetek îdiolojîk, tu hizrînek siyasî û îtiqadî xincî îdiolojiya xwe pesend nake, herweha nebûna aliyên kêm ji azadiyên civakî û binpêkirina mafên kêmaniyên olî, cinsî û ..., bûye cehnemek bo beşek mezin ji xelkê Îranê. Tunebûna derfetên karî bo kesên pispor û pêkanîna seqayek berteng bo wan û bi giştî tunebûna seqa û derfetek ji bo geşekirina pisporan li Îranê, ew kesane Îranê bo sefera bo welatên pêşketî bi cih dihlêin.

Li gor amarên ber dest, Îran li salên 2009 û 2010 bi hebûna zêdetir ji 15 Hezar penahxwazan li pileya heftemîn a cîhanê cih girtiye, herweha bi giştî amara penaberên Îranî, di navbera 4 heya 6 Milyon kes tê nirxandin ku pêtir ji 2 Milyon kes ji wan penaberan di warekî taybetî de pisporin, bo mînak pêtir ji 12 Hezar ji penaberên Îranî li welatê Amerîkayê medreka "PHD" xwe hene ku 2000 kes ji wan endamên heyeta zanistî a zanîngehên Amerîkayê ne.

Herweha li welatê Îranê bi sedema şaşitî li pêkhateya hikûmetî û sînorên siyasî, gellek kes qurbaniyê siyasetên navendî ên desthilatê bûne. Hebûna netewên cur bi cur li Îranê û desthilatdariya dewletek navendî, herweha nahevahengiya rewşên çandî, civakî, olî û ... ên netewên ne fars, paradoksên cur bi cur navbera hikûmeta navendî û netewên Îranî çê kiriye.

Di vê rewşê de jiyana netewên xincî fars di warên cur bi cur de bi sedema bindestbûn di rewşekê xirab de ye. Û ger kes yan hizrînek yan saziyek bixwaze çareseriyek bo wan paradoksan bixe ber bas ji aliyê desthilata reha tewawxwaz tê serkutkirin. Li vê rewşê de gelek ji xelkê bi awayê take kesî yan li çarçoveya saziyek yan partiyek neçar dibin ku Îranê biterkînin. Em dibînin ku gellek ji penaxwazên Îranî ji netewên ne Fars ên Îranî pêk hatine.

# Paşayê Erebistanê renge îzna ajotvaniyê bide jinan

**Bi dehan jinên Erebistanê roja Înê di çarçoveya kempeyna nefermaniya medenî dest bi karê ajotvaniyê li hinek ji bajarên wî welatî de kirin. Erebistan take welat e ku ajotvanî ji bo jinan qedexe kiriye.**

Wan ji jinên nerazî ên Eebistanê li torên civakî ên "Facebook" û "Twitter"ê de ji jinên din daxwaz kirine ku tevlî vê xebata wan bin.

Li gorî gotina yek ji wan jinên nerazî, dema pêkanîna





guhertinan hatiye û ew dikarin vî karî bikin.

Li gorî nûçeyan, berpirsyarên dewletî nûçe û zanyariyên bilavkirî li malpera taybet ya Tevgera Jinan û dîmenên ku ji "YouTube"ê re hatibûn şandin sansor nekirin. Herweha berpirsyarên dewletî bi Polîsan ragehandine ku tu kesî negrin.

Gellek ji çavdêran li ser vê baweriyê ne ku paşayê Erebistanê wê biryarekê bide ku pitir wek diyariyekê bo xelkê welatê wî be. Renge navbirî destpêkê de îznê bide jinên ku di gundand e dijîn ajotvanioyê bikin, piştre îznê bide jinan ku li nav bajaran de jî karê xwe ê ajotvaniyê bikin.

# Zarokên karker



Keyhan Yûsifî

Dîmenek nasiyar ku renge em gellek caran bi bê baldan jê derbas bûne, zarokek ku çend beste benûşt yan çiqek gul li dest de ye û li nav kolanan û li tirafîklay an ber bi tirombêlan ve diçe da ku bikare wan tiştên xwe bifroşe, yan zarokek bê guneh ku bi lahîkirin ji me dixwaze ku em îznê bidin solê me paqij bike. "Zarokên Kar", yek ji pirsgirêkên niha yên civakên cîhanî ye ku weke pirsek bingehîn li gellek welatên cîhanê tê hesibandin.

Roja 22'ê June, roja cîhanî ya dijberî li gel karkirina zarokan e. Rojek ku divê vijdana me şiyar be û em bala xwe bidin vê diyardeyê, û bi vê yekê bifikirin ku erê gelo me erkê mirovî yê xwe di vî warî de bi cih gihandiye?

Li gor amarên cîhanî nêzîk bi 215 Milyon "Zarokên Kar" li cîhanê hene ku nêzîk bi 115 Milyon ji wan mijûlî karên giran û metirsîdar in. Herweha salane 22 Hezar zarok li dema encamdana kar canê xwe ji dest didin.

Erkê hikûmetên berpirsiyar û demokratîk cî bi cîkirina rifah û berhemanîna civakek paqij û saxlem bo hevwelatiyên xwe ye, lê mixabin li welatên ne demokratîk bi sedema desthilatdariya hikûmetên bêkefayet, xwe li hember tu pirsgirêkek civakî û rifahî berpirsiyar nizanin û ewleviyeta pilanên hikûmetdariyên wan jî parastina desthilatdariy û berjewendiyên şexsî ên xwe ne. Hikûmetên han bi xwe yek ji sedemên herî girîng in bo pêkhatina pirsgirêkên civakî weke "Zarokên Kar" û çewsandina abûrî a zarokan li van welatan bi awayek berfireh tê encamdan.

Taybetmendiyên Karê zarokan ji aliyê Saziya Navnetewî a Kar(ILO) ve bi vî awayî hatiye pênasekirin:

1.Di warê hizrî, cesteyî, civakî û exalqî de bo zarokan metirsîdar bin.

2.Bi awayên jêr pêvajoya xwendin û perwerdeya zarokan tûşî xisarê bike:

-Bêparbûn ji xwendin

-Bikaranîna zorê bo xwendin

-Bikaranîna zorê bo encamdana karên giran û dirêjdem, hevdem li gel xwendinê.

Li pirraniya welatên cîhanê, hikûmet li hember pêvajoya perwerde li asta serekî ya xwendina zarokan berpirsiyar e, herweha erkdar in ku pêvajoya xwendinê bo zarokan xorayî be, lê mixabin bêparbûn ji xwendinê bo zarokan ji aliyê pêkhateya civakî – abûrî û çandî a civakên paremayî ve bi ser zarokan de hatiye sepandin û hikûmetên zal bi ser wan welataan jî bi sedema pêkhateya ne demokratîk a xwe di vî warî de bersivder ninin.

Karê zarokan yan zarokên kar, wek pirsek bingehîn li Îranê derketiye holê. Amarek rastîn ji zarokên kar li Îranê li ber dest de tune ye, Saziya "Bêhzîstî" a Îranê hejmara zarokên kar li navbera 700 heya 1 Milyon kesî dinirxîne, herweha îdareya Serjimêriya Îranê hejmara wan zarokan nêzîk bi 2.5 Milyon kesî dizane. Mebest ji zarok, (zarokên jêr 15 salî ne). Eva di demekê de ye ku Nadir Talibî, berpirsê navenda Lêkolîn û Berevanî ji Zarokên Kar li hevpeyvînek tevî Radiyo Dûçevle(22'ê June a 2011), hejmara zarokên karê ji 3.5 heya 4 Milyon kes nirxandiye.


Helbet tunebûna amarek rastîn di vî warî de kêşeyek bingehîn e ku saziyên pêwendîdar serjimêriyên dirost di vî warî de belav nakin.

Sedema bingehîn ya hebûna zarokên kar, rewşa xirab ya abûriya jiyana wan e û heya ku pirsgirêkên abûrî li welat de nehên çareserkirin, zarokên kar jî weke pirsek micid a civakî heye.

Em divê li berçav bigrin ku zarok bo cî bi cîkirina hewcehiyên jiyana malbata xwe kar dikin û eva hejariya abûrî ya malbatan e ku zarokan han dide kar bikin û xwe ji seqa û dinyaya zarokatiya xwe bêpar bikin.

Bê guman aboriyek paqij û hikûmetek berpirsiyar û bersivder li hember rewşa jiyan û rifaha hevwelatiyan, dikare bibe hegera kêmkirina asta zarokên kar û pêkanîna seqayek baştir bo zarokan, jiber ku zarok afirînerên rewşa civakî û sermayeyên pêşerojê ne ku divê bi awayek dirust û usûlî bihên perwedekirin ku bikarin xizmetê bi civaka xwe bikin.

Rewşa xirab a abûrî û çandî ku ji aliyê rejîmê ve bi ser rojhilata Kurdistanê de hatiye sepandin, bûye sedema vê yekê ku diyardeya zarokên kar li wê herêmê de pêtir bin. Beşek pirr ji heşîmeta Kurdistanê li gundan dijîn û zarokên gund li Kurdistanê jî neçarin dest bi karên giran û zehmet weke pezdarî û cûtyarî bikin yan li gelek ji deverên sînorî mijûlî kasibî û kolberiyê bin û seqaya bi rewşa zaroktiya wan, dibe seqayek tund û tûj û nexweş.



## Jineke Kaşmerî destdirêjî jê hate kirin



Malpera Nesîmanlayn: Jina ciwan ya bajarê Kaşmerê ku ji aliyê hejmarek ji torî û tolazên wî bajarî ve destdirêjiya seksî jê hatibûkirin li hevpeyvîneke tevî nûçegihanê vê malperê de got: Mêrê min du sal e ku madeyên hişber bi kar tîne û çend sale malbata xwe terkandiye. Heyamek e ku ez mêrek sax û bi hurmet nas dikim û seba hevkariyên wî bi min û zarokên min, me bi hev re pêwendiyek paqij hebû. Mehek berî niha gava ku li gel wî ji ser karê xwe vedigeriyan, li nava rê sekinîn û mijûlî axavtinê bûn ku çend kes bi motorsîklêtan li cem me sekinîn.

Wê domand: ew 5-6 kes bûn û hevalê min ji tirombêlê dexistin û destpêkirin bi lêdana wî û pere, medrek û zêr û mobilên me bi zorê ji me standin. Wan ez birim nav zewiyan û destdirêjî li min kirin.

Herweha nêzîk bi du heftî berî niha li gundekê devera "Xumiynîşehr"ê li parêzgeha Îsfehan de destdirêjiya seksî jî 6 jinan hatibû kirin. Eva di demekê de ye ku Cihdirê Berpirsê ezgeha dadwerî yê rejîmê li bersivek di warê wan bûyeran de got: Ewlehiya jinên Îranî li çav welatên rojavayî li astek gellek jor de ye û jinên Îranî li jêr sîbera Komara Îslami di rewşekê pirr baş de dijîn.

## Xwendekarên Îranî welatê xwe bi cî dihêlin

Herçend ku heya niha tu serjimêriyek hûr û dirust, li ser hejmara xwendekarêln Îranî ên ku li dervay welat mijûlî xwendinê ne, nehatiye bilavkirin, lê kargêrê giştî yê karûbarên xwendekarên li dervay welat li ser vê bawerê ye ku aliyê kêm nîv milyom Îranî li dervay welat xwendekar in.

kargêrê giştî yê karûbarên xwendekarên li dervay welat wate Hesen Moslimîli derbarê pêvajoya dereketina xwazyarên perwerdeya bilind, ji welat got: "ez bawer nakim ku ên daxwazkarê xwndina li qonaxa karnasî deji welat derkevin,lê weha diyar e ku xelk bixwe zarokên xwe dişînin dervay welêt.

Navbirî derbarê hejmara xwendekaran li dervay welat de ragehand ku li ser bingeha serjimêriyan 80 hezar xwendekarên Îranî li dervey welat de hene ku bi armanca xwendinê çûne dervay welat.

Hesen Moslimî herweha bi nbûçegihaniya Mêhr ragehand ku li serjimêriyan de hatijye gotin ku ji sedî 70 xwendekarên Îranî li qonaxa karnasî de kar dikin ku ew hejmar ne kêm e.

# Bîranîna du sitêrkên esmanê wêjeya Kurdî

**A: Kewê Zer**


Guman tune ye ku her neteweyek medyonê xizmetkarên parastina ziman û wêjeya xwe ne. Netewa Kurd jî her weke bi caran hatiye gotin ku di riya parastina zimanê xwe de weke netewe zindî maye ku bi hewl û keda wêjevan, nivîskar û helbestvanên berê ên di dîroka gelê Kurd de bişkivtine, gellek peyvên sereke ên pêkînerên zimanê Kurdî ji mirinê rizgar kirine û xwe kirine sitûna ragirtina ziman ji bo parastina netewa xwe.

Xizmetkar û zehmetkêşên ziman û wêjeya Kurdî gelek in ku her yek ji wan cihê rêz û hurmeta gelê me ne. Ji wan xizmetkaran du kestiyên bi nav û deng û sitêrkên esmanê wêjeya Kurdî ku gellek pişkojên zimanê Kurdî kirin gulên geş, Pîremêrd ê nemir û Sadiq Behaedîn Amêdiyê hertim zindî ne. Ger bi kurtî jî be, di bîranîna wan de, emê li ser jiyan û xizmeta wan bi gel û nîştimana xwe çend peyvan bixin ber çavên xwendevanên hêja.

**Pîremêrd**

Navê Pîremêrd yê rastîn, Tewfîq bûye. Tewfîq Kurê Mehmûd Axayê kurê Hemze Axa, di sala 1867'an de li bajarê Silêmaniyê ji dayîk bûye. Ji ber ku navbirî piştî salan çûye hecê û jêre gotine "Hacî Tewfîq", û "Pîremêr" yan "Pîremêrd" nasnavê nemir Hacî Tewfîq bûye. Ev nasnav di jiyana wî de wusa cihê xwe girtiye ku her kes bi vî navî ew nas kirine û dinasin. Heya bi xwe jî, xwe bi navê Pîremêrd daye nasîn, herweha di dîroka wêjeya kurdî û pirtûkên xwe û ên din de jî bi vî nasnavî 0hatiye naskirin.

Pîremêrdê bi nav û deng, zaroktiya xwe di bajarê Silêmaniyeyê de derbas dike. Çanda xwe ya zarokatî ji malbata xwe û zarokên Silêmaniyeyê hîn dibe. Di temenê 6-7 saliya xwe de dest bi xwendina Qurana pîroz dike û di demeke kin de diqedîne. piştre derbazî debistanên Kurdistanê dibe û dest bi jiyana xwendinê dike û di vê xwendinê de him pirtûkên Erebî û him jî pirtûkên Farsî dixwîne. Ji bo pêtir hînbûna van her du zimanan, diçe bal Mela Mihemedê pêşnimêjê mizgefta Hemze Axa. Li wir heyameke dirêj dimîne û dixwîne û him xwendina debistanê diqedîne û him jî zimanê Erebî û Farsî bi başî hîn dibe. Di ber xwendina xwe re gelek helbestên Kurdî, Erebî û Farsî jî dixwîne û gelek rind hînî wêjeya wan sê zimanan jî dibe. Ger bi kêmî jî be, bi zimanê Erebî û Farisî helbest jî nivîsandine.


Pîremêrd

Pîremêrd, di dema feqîtiya xwe de, li gelek bajar û debistanên Kurdistanê geriyaye û kesên cur bi cur dîtine. Ji wan gelek ramanên cîhanê hîn bûye. Ev stêrka li asîmanê wêjeya Kurdî, dema dest bi xwendina debistanê kiriye, gelek helbestên helbestvanên Kurd ên bi nav û beng wekê Hacî Qadirê Koyî, Nalî, Mehwî, Şêx Riza Talebanî û Mewlewî dixwendin. Dû re hêdî hêdî bi aliyê raçandina helbestên Kurdî ve diherike û di dema feqîtiya xwe de bi zaravaya Soranî gelek helbest vehûnandine û nivîsandine.

Pîremêrd, di navbera salên 1882 û 1898'an de karmendiya hukumetê dike. Di sala 1882'an de li bajarê Silêmaniyê dibe katibê nifûsê û di sala 1886'an de dibe katibê sereke yê mehkemeyê. Di sala 1895'an de li bajarê Kerbeleyê dibe cihgirê dozgerê pirsyarî. Di sala 1898'an de li gel Şêx Seîdê bavê Şêx Mehmûd diçe Turkiyê û ji wir jî bi hev re diçin hecê û piştre vedigere bajarê Silêmaniyê.

Di sala 1891'an de tevî Şêx Ehmedê Xaneqînî û helbestkar Wefayî diçin Turkiyê û li bajarê Stebolê akincî dibe. Piştî heyamekê karbidestên Perlemana Osmaniyan pê dihesin ku Pîremêrd li ser zimanê Farisî şarezayî heye, wî dikin endamê Perlemana Bilind û ritbeya Begîtiyê didinê. piştî heyamekê karkirin li ser wê postê, diçe zankoya Stenbolê û di peymangeha maf de qeyda xwe çêdike û dest davêje xwendina bilind.

Serkevtiyane peymangeha xwe dixwîne û diqedîne. Piştî heyamekê dest bi karê parêzeriyê dike û dibe parêzerek jêhatî. Li bajarê Stenbolê nivîsxaneyekê vedike û parêzeriyê bi rewşeke pirr baş dimeşîne û di vê navberê de bi keçeke Turk re dizewice û dibe xwedî malbat.

bîrên Kurd ve civatekê bi navê "Kürı
li bajarê Stenbolê damezirandin û ji
neya Alîkar û Pêşketina Kurd) diweş
e helbestên xwe jî di rojnameyê de d

Pîremêrd, di sala 1909'an de dibe Qaymeqamê Colemergê, lê piştre ew jin û du Kurên xwe li Turkiyê dihêle û vedigere bajarê Silêmaniyê. Wî çaxî li bajarê Silêmaniyê rojnameya "Jîn" di bin berpirsatiya Husên Nazim de dihat weşandin. Husên Nazim, serperestiya wê rojnameyê dispêre Pîremêrd.

Di sala 1934'an de Husên Nazim diçe ber dilovaniya xwe û Pîremêrd dibe rêveberê rojnameya "Jîn". Heya sala koça dawiya xwe "1950" weşandina rojnameya "Jîn" didomîne.

Di vê jiyana pirr şanazî û serkevtinên ji dîv hev de, Pîremêrdê nemir tu car ji helbest û wêjeya Kurdî xafil nebûye û çendîn pirtûk belav kirine ku her yek ji wan niha weke çavkaniyek mezin a wêjeya Kurdî mifah jê tê sitandin.

**Sadiq Behaedîn**

Li gulana sala 1918"an de kulîlkek li Amêdiyê bişkivî û rteng û xemlek rind da wêjeya Kurdî. Behaedîn Amêdî, li malbatek bajarê Amêdiyê ku bi malbata "Mala Kûta" yan "Kûta Zade" dihat naskirin, ji dayîk bûye. Li sala 1932'an di temenê 8 saliyê de li xwendongeha Amêdiyê de xwendina xwe a destpêkî qedandiye, lê seba destkurtiyê nekariye xwendina xwe berdewam bike.

Ev li ber belengaziyê diçe bajarê Mûsilê ji bo kasibiyê. Piştî sê salan, Behaedîn ji nûve li bajarê Mûsilê dest bi xwendinê dike û piştî bidawî anîna wê qonaxê, diçe bexdayê bi armnaca dirêjîdan bi xwendina bilin. Li wir di beşa civakî de dirêjî bi xwendinê dide û piştî qedandina wê qonaxa xwendinê, li bajarê Kerkûkê dibe mamosta. Sala 1944'an, navbirî bo heyamê 7 salan hatiye veguheztin bo bajarokê Helebceyê û piştre hatiye veguheztin bo bajarê Silêmaniyê û li wir jî bo bajarê Zaxoyê bar kiriye û di dawî de berê vî ketiye bajarê "Hêt" ku cihê destpêka wî bi kar û barên wêjeyî bûye, lê tenê salekê li wir dimîne û piştre dihê veguheztin bo bajarê Bexdayê û bo heyamê 17 salan li Bexda û Amêdiyê çalakî nîşan dane û mamostayî kiriye, 5 salan li wezareta Perwerde di rêveberiyê xwendina Kurdî û piştre bûye endamê heyeta zimanê Kurdî li Komarra Zanyarî a Kurdî û hevdem li zanîngeha Bexdayê bo heyamê 6 salan wane gotine.

Behaedîn Amêdî beşdariyek çalakane di girûp û senterên rewşenbîrî û dezgehên ragihandinan de hebûye, ji wana, "Yaneya Serkevtin" û radyoya Kurdî a Bexdayê her di sala 1956'an de heya dawiya temenê xzwe.

Navbirî gelek gotar û mijar li ser wêjeye, ziman, kar û barên civakî ên Kurdî di rojname, kuvar û radyoyên Kurdî de belav kirine. Ji wan belavokên ku Bihaedîn nivîsên xwe tê de belav kirine, em dikarin amaje bi Birayî, Birayetî, Hawkarî, Rojî Nwê, Beyan, Rewşenbîrî Nwê, kuvara Çiya, Nûserî Kurd, Rojî Kurdistan, Deftera Kudewarî, Ronahî û kuvara Korî Zanyarî bikin.

Ji alieyk din ve jî Sadiq Behaedîn çendîn pirtûk çap kirine û herweha di gele pirtûkên edîb û helbestvanên mezin ên Kurd de kurtejîn li ser wan di pirtûkên wan de nivîsandine. Bo mînak, jiyana Ehmedê Xanê di pirtûka Mem û Zîn de, jiyana Ehmedê Nalbend di dîwana Ehmedê Nalbend de, pêşgotina pirtûka hozanvan Mihemed Amîn Axa Akreyî di a "Pişkojek ji Baxçên Kurdistanê" û çendîn çalakiyên din ên berbiçav di Kora Zanyariya Kurd li Bexdayê, tenê beşek ji xizmet û keda wî hozanvanê mezin yê Kurd e ku pêşkêş bi netewa xwe kirine. Hizrek mezine Sadiq Behaedîn ku cihê şanaziya netewa me ye, ev e ku navbirî dibêje:

Danîna pirtûkek hevbeş a pêkhatî ji her du zaraveyên sereke ên Kurdî wate Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Jêrîn, hêvî û omêda min e. Di rastî de jî Behaedîn di her du wan zaravan de kar û xizmet kiriye û di her duyan de jî şarezayiyek baş hebûye.

Di rastî de Sadiq Behaedîn Amêdî hemû jiyana xwe ji bo xizmet bi wêjeya Kurdî danabû û di encam de serbilindiyek mezin kir nisîbê xwe, ji ber ku dest û penceyên wî niha û hertim dê di nava wêjeya Kurdî de xuya bin, çimku xizmetên wê demê ên hozanvan û nivîskarên Kurd, garantiya zindîragirtina zimanê gelek bindest û bêpar ji her çalakiyek çanda netewî bû. Bêînsafî ye ku di her serdem û dewranrkê de bas ji man û berxwedanî û serkevtinên netewa Kurd bihê kirin bi bê amajekirin bi wêjewan, helbestvan û nivîskarên Kurd, ku Sadiq Behaedîn yek ji wan mirovên xwedîşerefek bilin e.

Yad û bîranîna Sadiq Behaedîn û Hacî Tewfîq "Pîremêrd" hertim di dilê gel de zindî ye û her serkevtinek gelê me di pêşerojê de jî cihek ji bo bîranîn û pêzanîna ked û zehmeta wan du xizmetkarên wêje û zimanê Kurdî û herweha hemû seyda, hozanvan, nivîskar û mamostayên ku di vê riyê de bi hest bi berpirsyariyek mezin îza kişandine, vala ye.


Sadiq Behaedîn

www.avestakurd.org

## Qêrînek ji Qendîlê bo Agirî û Dalaho:

# ÊRE DENGÊ KURDISTANA ÎRANÊ YE



Ceifer Mubeşirniya

Ger damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê û avabûna Komara Kurdistan Îranê li ser destê vê partiyê û ev kar û xizmetên ku vê komarê di warê çandî, bi taybet perwerdeyê de li gor şiyan, weke belavok û xwendina bi zimanê Kurdî û ...li ber çavan de bihê derbaskirin, ku niha jî partiya han her li ser wê bingehê xebata xwe dimeşîne, derdikeve ku ev partî çiqas girîngiyê dide kar û xebata çandî ji bo pêtir hişyarkirina xelkê bi taybetî di warê pirsa netewî de.

Eva ku weke rastiyekê pêwîst e bihê gotin, piştî hiloşîna Komara Kurdistanê û qedexekirina çalakiyên PDKÎ û herweha di xirabtirîn rewş de ku axaftin ji man û nemana wê partiyê dihat kirin, dîsan bi her awayekê, wefadarên Partiya Demokrat û dilsojên gelê Kurd, li kêleka xebata siyasî dev ji xebata çandî ji bo pêtir hişyarkirin û gihandina dengê nerazîtî û azadîxwaziyê bernedan. Weşandina berdewam a rojnameya Kurdistan organa Komîteya Navendî a Partiya Demokrat, berçavtirîn mînak ji bo eyankirina vê rastiyê ye.

Tenê pêtir ji 50 salan berî niha bû ku gelên xwe ji teknolojiya wê demê wate ragihgandina esmanî, yan mifahstandin ji pêlên esmanî bo gihandina dengên pêwîst bo nava tex û qatên civakê de, bi tiliyên destan dihatin hejmartin. Eva jî di encama zolma netewî a dewletên desthilatdar bi ser neteweyên bindest, yek ji wan mezintirîn netewan, gelê Kurd bû ku ji her cure alavek pêwendîgirtin û pêşkevtinê ji aliyê dîktatorên zal bi ser gelê me de û dewletên zal bi ser cîhanê de hatibû bêparkirin.

Beşek ji axa vê netewa pirrheşîmet û bê desthilat, di bin perrê reş yê rejîmên dîktator ên desthilatdar di Îranê de bûye û niha jî zolma han dimeşe, dengê azadîxwaziya wê beşa gelê me tenê ji riya hizûra hêzên pêşmerge ên PDKÎ û di nava texek taybet de jî, ji riya rojnameya Kurdistanê ve dihat bihîstin.

Rewşa han berdewam bû heya sala 1980'î, û li wir pêve yekem radyoya ku dengê rastîn yê gelê Kurd belav kir, hat avakirin.

Radyo Dengê Kurdistana Îranê, dengek mafxwazane û qîrînek bibandor li ser dil û derûna netewa Kurd ji bo pêtir haydarkirina xelkê Kurdistanê ji pîlanên dujminkarane ên rejîma dîktator a taze bi desthilatgihîştiye Xumêniyê cellad, li dijî xelkê zolmlêkirî û bê xwedî, avek bi agir de kir.

**"Êre Dengê Kurdistana Îranê Ye"**, bo yekem car bû ku guhdarên radyoyan di nava gelê Kurd de têr dikirin. Çimku dengek nebû ku tenê bo derbaskirina dem guhadarên xwe xafilandiban, belkî dengek bû ku li gel xwîna her guhdarek Kurd dikeliya û her peyvek ku ji aliyê wê radyoyê ve dihat pêşkêşkirin teibîr ji çawaniya çareserî û dermankirina jan û birînên sedansale ên ku li ser gelê Kurd dimeşe, dikir.

Ger mirov guhdariya yekem peyama Dr. Qasimloyê nemir di yekemîn roja destbikarbûna Radyo Dengê Kurdistana Îranê de bike, ji tona deng û lîstin bi peyvan ji aliyê xemxorê sereke yê avakirina radyoyê wate Dr. Qasimlo ve xuya ye ku bihîstina dengê wî cudahiyek tevî gotin û peyamên din ên vî serdarê bi nav û dengê Kurd ku di radyo û kenalên din ên rehên wan ji dil û derûna gelê Kurd ve av nedixwarin de heye.

Her çend weke siyasetek qirêj a hertimiye xwe, Komar Îslamî destê gemar yê xwe bi armanca şêlûkirina zelaliya daxwaz û mebestên gelê Kurd ji tu xirabkariyekê naparêze, li hember zelaliya dengê Radyo Dengê Kurdistana Îranê de jî bi parazîta li ser dengê vê radyoyê bi armanca bêparkirina guhdaran ji dazwaza mafên sereke û rewa ên netewiye xwe, pêtir dujminatiya xwe li hember gelê Kurd eyan kir û heya ser hestiyan xelkê Kurd bi wan kiryarên neexlaqî hêrs kir û pêtir li ser xebat bo gihîştin bi wan mafan pêdagir kir, û bi giştî civaka Kurdî ji aramiya jiyanê bi bê Komara Îslamî piştrast kir.

Lê dîsan mafxwazên Kurd weke qebûlkirina her îzayek din bi zehmetek zaf qenaet bi guhdariya dengê azadî û parazîtên Komara Îslamî dikirin, nek guhdarîkirin ji çend gotinên xapîner bi zimanê Kurdî di riya hin radyoyên din ên hikûmetî ku tenê ziman Kurdî bû yan bi awayek din bêjin, belavkirina hin çîrok û sitranên Kurdî ku bi tu awayekê bas ji dîrok, serpêhatî yan her peyvek ku bêhna netewî a Kurd jê bihatiba, ji wan radyoyan nedihat bihîstin. Bê guman di rewş û zirûfek weha de, dengê rastîn yê Kurdî bi daxwazên rewa ên netewa Kurd, ji aliyê Radyo Dengê Kurdistana Îranê ve xureka can û derûna xelkê Kurd bû.

Niha piştî 31 salan serbarê dîtina bi sedan qerqeşe û gefên daxistinê, topbaranên Komara Îslamî û veguhastin li wî çiyayî bo çiyayê din, û dehan pîlanên din, lê hêj bi ked û mêrxasiya xebatkarên radiyoyê, dengê Kurdistana Îranê her zelal û bilind, berdewam bûye û kariye erkê pîroz yê xwe bi başî bi cî bigihîne û cî û pêgeha xwe nede lêjkirinê.

Ewa jî tenê mirov dikare di îman û morala yek bi yek ji xebatkarên berê û niha ên wê radyoyê de garantî bike, lewma di 31 saliya xebata Radyo Dengê Kurdistana Îranê de, erk e ku silavek ji keda dil ve ji hemû xebatkarên dîroka wê radyoyê re bihê şandin û pîrozbahiya vê serkevtina dîrokî û netewî berî her kesê ji wan xebatkaran bihê kirin, vêca ji hemû gelê Kurd.




## Êş û Jan



**Ebdurehîmê Mûşî**

Ev çi êş e, çi jan e?
Ecêbek pirr giran e!
Derdekî bê derman e
Gelê me di xew da ne

Ne xewn û ne xiyal in
Bê qewl û bê qirar in
Ajanê dujmina nin
Heko, sedo û kamran'in

Tev xayinê welat in
Endamê neyara nin
Bi bertîlla xapand in
Heko, sedo û kamran'in

Piştîvanê neyar in
Goştê gelê me xwar in
Hevbeşê guneh kar in
Heko, sedo û kamran'in

Gelo kengê hişyar bin
Ne xayinê welat bin
Pêşmergê Kurdistan bin
Azad û serfiraz bin

Ji bo welat bi kar bin
Ne li dû bin li pêş bin
Mîna leheng û şer bin
Azad û serbixwe bin

Em jî wekî milleta
Azad û serfiraz bin
Ala rengîn li bakin
Derdê dila derman kin

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com


Agirî

## Navê bûka 42 salî çû nav pirtûka "Gêns" de

**Jineke 42 salî ku xwe bi 7hezar gustîlan ve xemilandibû, zevicî û li ser asta cîhanê wek jina herî bi xemil, di vê şêwazê de hate naskirin.**

Malpera rojnameya Deylî Meylî ya Birîtanyayê bilav kir ku li herêma Êdinboroya Îskatlendê de jinek bi navê Alayn Dêyvîd Sun li rê û resmekî taybetî de li gel hezlêkirye xwe jiyana hevbeş pêk anî.



Ya ku li daweta wan de bala amadebûyan bo aliyê xwe rakêşa, rû û cesteyê bûkê bû, ku xwe bi 6 hezar û 925 gustîlên cur bi cur û bi kincên bûkîniyê xemilandibû lê zava tenê gostîlek jî di desta de xûya nedikir.

Rê û resma marebirîna bûk û zava li nivîsîngeha zewacê ya Daglas Watson de birêve çû, û tenê 35 deqeyan kêşa.

Li gorî vê raporê ew jin bi eslê xwe xelkê Birizîlê ye, lê ji mêjve ye ku li Birîtanyayê dijî.

Bi vî awayî navê vê bûka delal li nav pirtûka Gêns de hate tomarkirin.

## "Di Îranê de heta yek kes jî hewcedarê nanê şevê nine".



**Ehmedînijad serkomarê Îranê ku bi beşdariya di civîna welatên girûpa Şanghay de, çûbû bajarê Astane paytexta welatê Qezaqistanê di civîneke de ku ji bo Îraniyên akinciyê wir pêk anîbû, ragehand ku em dikarin ku îdia bikin ku îro di Îranê de heta yek kes jî hewcedarê nanê şevê nine,**

Navbirî herweha ragehand ku xwedê hez ke, dê bê ragehandin ku Îranê de tu kes hejar nine,

Firêydun Xawend, aborîzan li Parîsê de li ser vê bawerê ye ku heta berpirsyarên welatên wek Swîs û Pirins akinciyên Munako yan Lîxtênîştaynê jînikarin îdiayej bi vî awayî bikin.

Navbirî herweha di vê deheqê de got ku berpirsyarên rejîma Îranê serjimêriyên di warê hêla hejariyê bilav nakin lê lêkolîna ku li wan rojên daviyê de ji aliyê sê lêkolînvanên Îranî ve hatiye amade kirin, nîşan dide ku %44 ji nifûsa Îranê wate 23 milyon kes li jêr hêla hejariyê de dijîn.

Ew axavtina Ehmedînijad di demekê de ye ku şaredarê Tehranê dema ku di bajarê Teharanê de çavê wî ketiye tabloyekê li ser deriyê nanpêjiyekê ku li ser hatiye nivîsandin, "em nan bi qer nadin", ecêbgirtî maye, û piştre dest bi lêkolîna di vî warî de kiriye û jêre derketiye ku li hinek ciyan li Tehranê de kesên weha hene ku nikarin têra zikê xwe nanê hişik jî bikirin.

## Keçek kurd bi cilên kurdî bû xweşika Hollywoode



**Keça kurd Sureya Fellah roja înê li Universal City`yê di Hotêl Hîltonê de bi cilên kurdî beşdarî merasîma hilbijardina şacuwanê bû û bû yekem.**

Li gorî ajansên nûçeyan di hilbijardina şaciwan a 2011`an li Amerîkayê, jineke Kurd bi navê Sureya Fellah beşdarî kir û pileya yekem bi dest xist.

Sureya Fellah yek ji çalakvanên Mafê Mirovan û Mafê Jinê û har wiha parêzvanê Mafê grûpên etnîkî û olî ye. Her wiha ew rawêjkar û şêwirmendê karûbarên mafê mirovan e û gelek ji hevpêyvîn û daxuyaniyên wê li ser rewşa girtiyên sisyêiyên Kurd û grûpên etnîkî û olî

## Zarokek Behayî jiber beşdarînekirin li nimêja misilmanan de hat daxkirin



**Zarokek Behayî li bajarê Şîrazê bi egera beşdarînekirina di nêmêja Cemaetê de ji aliyê mamostayê xwe ve kut û lêdan xwar**

Li gorî ajansa nûçeyan ya Civaka Behayiyan, li wan dawiyane de Anahîta Zehrayî akinciyê Şîrazê ku li yek ji xwendingehên dewletî ên Şîrazê li pola yekê a destpêkî de ders dixwend, seba vê ku li nimêja Cemaetê de beşdarî nekir ji aliyê mamostayê xw ê Misilman ve kete ber lêdanê.

Mamosta ji bilî vê ku li vî zarokî xistibû, destê wî jî dax kiriye. Dema ku diya wî zarokî pê dihese û li hemberî wê kiryara mamosta de nerazîbûna xwe eşkere dike, mamosta di ciyê vê ku lêborîna xwe bixwaze, bi şanazî ve bas ji lêdana vî zarokî dike. Lewra dê û bavê wî zarokî riyên yasayî bi dijî vê kiyara mamostayê Mislman digirne pêş.

## Profesor Maksîmê Xemo Koça Dawiyê Kir



**Nivîskar û lêlolînerê navdar Profesor Maksîmê Xemo, çû ber dilovanîya Xwedê.**

Li gorî ragihandina Ajansa Nûçeyan a Firatê, Profesor Xemo jiber nexweşiya penceşêra qirikê, li gundê Avşînê yê Yerîvanê koça dawî kiriye. Zimanzanê navdar Maksîmê Xemo ji sala 1995'an heta mirina xwe li Enstîtoya Rojhilatzaniyê ya Akademîya Ermenîstanê, wekî Serokê Beşa Kurdzaniyê xebîtîye.

Profesor Maksîmê Xemo nêzîkî 120 pirtûk û gotarên zanîstî nivîsîne û berhemên wî bi Kurdî, Rusî û Ermenî hatine çap kirin. Profesor û Zimanzan Maksîmê Xemo beşdarî gelek konferans, sempozyom û civînên zanistî bûye û li ser kêşe û problemên zimanê Kurdî nêrînên xwe pêşkêş kirine.

## Du pizîşkên Kurd xelata Şêvra Cîhanî ya Saxlemiyê wergirtin

Kamyar û Areş Elayî, du pizîşkên Kurd yên bajarê Kirmaşanê ku li sala 2008'an de bi tometa hewldan bo hiloşandina rejîmê hatibûn hepsîkirin, roja Pênşemî, 16'ê Hezîranê, xelata Şêvra Cîhanî ya Saxlemiyê seba hewl û têkoşîn bo çareseriya nexweşiya Îdzê bi dest xistin.

Eva di demekê de ye ku Areş niha jî li girtîgeha Êvînê de ye û sê sal ji heyamê hukmê hepsa wî maye.



Saziya Lêborîna Navnetewî jî girtina wan du pizîşkên pispor, bi nerewa zanî û di heyama sê salên derbasbûyî de berdewam xwaziyarê serbestberdana wan du birayan bûye.

www.arsivakurd.org